Dumahîk :Sûriyê û Roja....

Ragihandina fermî digel hinde dezgehên dewleta Sûriyê bi hêrs û şewat li ser pirsa bikaranîna zimanê Erebî radiwestîn, didane pê , dikirine hawar û qîr ku zor pêwîste û divê xelkê Ereb karibe hê bêtir li zimanê xwe yê dê bibe xwedî , û vaye – xwedêgiravî – rêxistina Yonisko ya navnetewî roja 21ê Subatê bona giringiya vê yekê kiriye rojeke cîhanî, loma jî divê hemî navend , komele û dezgehên Sûriyê li zimanê erebî miqate bin .

Ne xeme mirov karibe bîne bîra xwe, ji ber ku hêjayî gotin û dubarekirinê ye ku, li Sûriyê li dirêjahiya 50 salên borî , gelek biryarên aşkere û yên veşartî li dijî bikaranîna zimanê me yê dê derçûne û hatine bikaranînin . Rol û kartêkirina wan biryarên qedexekirina zimanê me yê dê – Kurdî – hê berdewam û li dar in . Eve ne tenê nakokiyeke mezine , lê belê rûreşiya siyaseta şoven û toximperestî bi xwe ye .

Zanyarê hêja Mîr Celadet bedirxan ji berî bêtirî 70ê salî destê xwe dabû ser birînê , giringî û pêwîstiya zimanê dê baş naskiribû , bi dil û can jê re xebitîbû , di ber de şerekî mezin dikir , xwe pir pê mijûl kiribû , dida ser hev , dida ber hev , diponijî û dinivîsî . Ji nivîsarên nemir Celadet nameyeke vekirî ji Mistefa Kemal re bona zimanê kurdî bû , îro jî bo me Kurdan hêjaye mirov lê vegere , da ku em jî weke civat , rêxistin , weşan û kes li Sûriyê karibin hê bêtir li zimanê xwe yê dê bibine xwedî û hersal bi hatina roja 21ê Subatê re silavên germ ji Yonisko re biînin .

Sînorê Yekta.

Dumahîk :Danezana Şamê

Ne tenê weha jî , mixabin tenê yên Ereb girtî hîştin . Bi wê jî nekirin , peyê xwe şandin û otombîlên ên mîna Semîr Neşar û Mihemed Hecî Derwîş şikandin û ava esîtê bi ser de reşandin . Daxwazên wan ji ve pêlanê pir çûkan bi kevirekî bêxin . li alikî , tirs û cirfandinekê bixin dilên endamên Danezanê . Li aliyê din ziyanê bigihînin berjewendiyên kesên sebixwe . Û li aliyê din jî , kêmbawerî bikeve nav Ereb û Kurdan .

Gava dudiyê , şer û rûreşkirina Danezanê bi her awî li pêş xelkê Sûriyê , çi di riya ragiyandinê an jî di riya peya û hêzên ewlekariyê yên xwe re . Mîna girêdana Danezanê bi drve yên ne dost bi Sûriyê re û bi taybetî Emerîka re.Gunehkirina Danezanê bi gurkirina quretaiya netewan û bi taybetî netewa Kurd li Sûriyê, û nepiştgiriya hêzên bexwedanker li hember Israîl ,…..û H.W.D .

Gava sisiyê , hewildanek din jî belkîm hebe û di paşerojê de xuya bibe, ew jî hurutandina hin kes û hêzan ku, Danezan û pilatformine din avabikin . Da ku, bi zanebûn an bê zanebûn di xizmet armancên wan Kevin . Û Danezana Şamê jar bikeve , û hêzên wê ji ber hev bi dûrkevin.

Raste tiştê Rijîma Sûriyê kirî û dike ziyanê digihîne xebat û çalakiyên Ragiyandina Şamê . Lê , divê em ji bîr nekin jî ku, li alîkî din jî ev ton karên qirêj sûde jî gihande wê . Ji alîkî ve xebat û çalakiyên wê ji dûr û nêzîk re berbiçavkir , ji aliyê din ve piştgir û dostên wê li hundir û derve zêdekir, û ji alîkî din ve jî herdiçe baweriya pirekan ji endamên Danezanê bi vê xebata demoqras û pîroz di hundir Sûriyê de zêde û geşd be , û bêtir bi hev ve têne girêdan .

Li ber vê roniyê , em bawerin ne tenê îro, sibe jî , û heya bi heya , çareserkirina hemî pirsgirêkên di vî welatî de , bi danûstandin û guftûgoyên demoqras û şaristanî , wê çareserbibin . Dibe hin caran velukume û raweste , lê divê dev jê neyê berdan û em jê venegerin . Ji ber ku , berjewendiya hemî gelên Sûriyê û bi taybetî yê gelê Kurd di wê riyê re pêk tê

Memê Alan